Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1291 | 20-Tîrmeh-2025 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ | rojnameyaronahi | @ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com | Rojnameya Ronahî | +963 984 370 218

# 'Bi çandina kulîlikan ez zindî dibim'

**Viyan Egîd/Qamişlo**

**Dayika ku bi hezkirina xwezayê û kulîlikan mezin bûye, Yara Mihemed diyar kir ku bi çandina kulîlikan ruhê wê zindî dibe û got: "Dema ku ez dordora xwe kulîlikan dibînin rehetiyek mezin di hindirê min de tê avakirin."**

Li kampa Newroz Jina bi navê Yara Ehmed Mihemed ji bajarê Helebê ye ku temenê wê 57 Sal e, lê mixabin dayekeke li erdê ye, bi sedemê nexweşiya şekir lingeke xwe winda kir. Lê dîsa jî ev yek ji bo jiyana wê nebû kelem ku hêz, moral û hêviyên wê werin şikandin. Her xwest ku bi çandina gul û kulîlkan êşa xwe ji bîr bike.

Dayika Yara xwedî malbat e, 5 zarok jê re çêbûn û her 5 jî xort bûn. Lê di destpêkirina jiyana wan de, hevjînê yara ji ber nexwşiyeke bêbext çû dilovaniya xwedê. Li vir dayika Yara bi hemû hewledan û hêza xwe, xwest zarokên xwe mezin bike û wan her serkeftî di jiyanê de bibîne. Di destpêka kirîza Sûriyê de ji ber şert û mercên giran koçberî Serêkaniyê bûn û li wir niştecih bûn, da ku zarokên xwe di jiyaneke aram û saxlem de mezin bike.

**Winda û bêdengî**

Di sala 2019`an de dema ku dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê êrişî bajrê Serêkaniyê kir, li vir wekî ku di kabûsekî de jiyan kir, her tiştê ku ji bo zarokê xwe kiribû belav bû. tenê bi qîrînên bê deng ji Serê kaniyê bi darê zorê hatin koçberkirin. Dayika Yara û zarokên xwe êdî neçar man ku koçberî Minbicê bibin. Dîsa jî her xwest ku ew jiyana li Serêkaniyê dabû afrandin li Minbicê ji nû vejîn bike. Tevî vê yekê jî Yara hêza xwe winda nekir û ji tiştekî ne tirsiya ji ber ku zarokên wê li cem wê bûn. Her wiha ji bo wê cih û mal ne giring bû lê belê ji bo wê himbêzkirina zarokên wê ya herî girîng bû. Yara zarokên xwe li ser esasê hezkirin û rêzdariyê mezin kirbû. Di sala 2020'an de zarokên Yara biryar dan ku vegerin mala xwe ya rûxandî li Serê Kaniyê. Di dema vegera zarokên Yara de mirin li benda wan bû, bi sedemê mayineke di mala wan a Serêkaniyê de her pênc zarokên wê jiyana xwe ji dest dan. Mayînên ku çeteyên dewleta Tirk a dagirker di malan de çandibûn bi zarokên Yara de teqiyan û Yara di jiyanê de bi tenê ma. Mixabin dayika Yara piştî windakirina her 5 zarokên xwe bi nexweşiyek bêbext ket û ev nexweşî roj bi roj girantir dibû. Bijîşkan jî neçar man ku lingê Yara qut bikin, bêguman dema ku pijîşkan bi dilekî xemgîn ji dayika Yara re gotin wê lingê te were qût kirin, dayika Yara bi ruyekî ken got: "Êşa windakirina 5 zarokên min hişt ku ez êşa jiyanê giştî ji bîr bikim û ez wan biçûk bibînim."







Dayika Yara xwe radestî jiyaneke xemgîn û şikestî nekir, lê belê xwest jiyana xwe bi çandina dar û gulan xweş û zindî bike. Her ku gulek diçîne navekî lê dike û wan bi kêfxweşî xwedî dike, belê dayika Yara nêzî gul û kûlîlkan dibe wekî ku parçeyek ji rihê wê ne. belê dayika Yara derdora kona xwe kiriya bihûşt ji xwezaya heyî, dema ku mirov diçe cem dayika Yara di aliyê derûnî de rehet dibe.

**Xwedîkirina lawiran**

Dema me ziyaretî dayika Yara li kampa Newroz kir, li derdora wê hemî gul û kulîlk bûn di heman demê de lawiran jî xwedî dikir Yara wiha axivî û got: "Dema ku ez dordora xwe kulîlkan dibînin rehetiyek mezin di hindirê min de tê avakirin. Bêguman di dema berê de min xwarin dida zarokên xwe lê bi derbasbûna demê re piştî ku zarokên min jiyana xwe ji dest dan, êdî kesekî min nema ku ez xwarin bidim wan û bi wan re mijûl bibim. Ji ber vê yekê min ev lawir kom kirin da ku her roj xwerin bidim wan û wan xwedî bikim. Ez her dem dihizirim ku ev lawir ji kulên min fêm dikin."

Dayika Yara dibêje ku ew dermanê xwe yê însolînê her roj ji Heyva Sor a Kurdî distîne.

Dema mirov di çavê dayika Yara mêze dike jiyaneka azad dibîne, ji ber wê hêz û baweriya wê ya mezin. Dayika Yara di vê jiyanê de tenduristî, zarok û hevjînê xwe winda kir lê belê xwe kêm nedît û roj bi roj xwe bi hêztir dike.

## Gotina Dawî



### Desthilata Colanî têk diçe!

**Mihemed Seydi**

Rewşa Sûriyê bi vê komkujiya mezin a duyem ku li dijî Durziyan li Siwêdayê pêk tê, derbasî qunaxeke nû dibe. Her çiqasî Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê hişyarî ji şerê navxweyî kirin, lê desthilata ku niha li Şamê ye her gef û tehdîd bi kar anîn û destpêkê li berava Sûriyê li dijî Elewiyan û niha jî li dijî Durziyan komkujiyan dike.
Piştî êrişên çend rojan a komên çete û bermahiyên DAIŞ'ê û El-Nusra yên Ebû Muhamed El-Colanî, ew li hember ciwan û civaka Durzî têk çûn. Bi zextên Israîlê jî neçar man ku hemû çeteyên xwe tevî çekên xwe yên giran ji nava deverê vekişin.
Di nava 24 seatan piştî vê binkeftina komên Colanî vê carê di warê ragihandinê de kombûn çêkirin û di bin navê Eşîrên Ereb li dijî Siwêdayê tevger çêkirin û kincên van koman bi Gelabiyên Erebî guhertin û wek ku zarokên Eşîranin dest bi komkujiyan kirin.
Lê li gorî di destpêka êrişan de jî me bala xwe dayê, ev amadekariyên di warê ragihandinê de eşkere dike ku hin hêzên li derveyî Sûriyê li pişt plana êrişan de ne.
Li aliyê din, hat idîakirin ku di êrişa Îsraîlê yên li dijî navenda serêkaniyê artêşa Sûriyê li Şamê de, hin berpirsên Istîxbaratê yên Tirk jî hebûne. Ev agahî çiqas raste an na, nayê zanîn, lê beriya çend heyvan eşkere bû ku komeke MÎT a Tirk li qesra serokkomariyê ya Şamê ew ê ku Ehmed El-Şeri bi rê ve dibe. Piştî van êrişan 18'ê Tîrmehê di gotinên serokê MHP Dewlet Bahçelî de eşkere bûn ku got; "Israîl dixwaze koorîdorekê di Siwêdayê re veke" û ev tevger jî wekî li dijî Tirkiyê bi nav kir.
Tişta ez dixwazim bibêjim ew e ku dewleta Tirk destpêkê xwest bi kuştina Elewiyan xelkê Sûriyê kontrol bike û bi komkujiyên li Siwêdayê Kurdan çavtirsandî bike. Ev siyaset beriya 10 sala bi destê DAIŞ'ê jî hat meşandin û di encamê de hêza QSD'ê derket holê û plana Tirkiyê têk çû.
Vê carê jî ne dûre bi komkirina van komên tundrew li hember Durziyan, hêzeke din li erdê bibe serwer ku ew jî li Siwêdayê be û bi rastî jî Durzî wê başurê Suriyê hemû kontrol bikin. Lê ev pêvajoya ku niha heye, destpêka têkçûna Ehmed El-Şerie û komên girêdayî wî ne ku dewleta Tirk xwe li pişt wan dibîne.
Gotina dawî ya dixwazim bibêjim, dewleta Tirk di komkujiyên li Siwêdayê de hêza sereke ye û ew şerê niha bi rê ve dibe.

## Sudoku:Pirs 49

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | 8 | 1 | | | | 6 | 3 | 4 |
| 2 | | | 1 | | | | 7 | |
| | | 5 | 3 | | | | | |
| 5 | 1 | 9 | | | 7 | | | |
| 6 | | | | | | | | 9 |
| | | | 4 | | | 1 | 5 | 2 |
| | | | | | 1 | 4 | | |
| | 4 | | | | 2 | | | 3 |
| 1 | 7 | 8 | | | | 2 | 6 | |

## Sudoku: Bersiv 48

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 9 | 5 | 8 | 3 | 7 | 2 | 4 | 1 | 6 |
| 1 | 2 | 7 | 6 | 4 | 8 | 9 | 3 | 5 |
| 3 | 6 | 4 | 9 | 5 | 1 | 8 | 2 | 7 |
| 2 | 4 | 1 | 5 | 9 | 6 | 3 | 7 | 8 |
| 7 | 8 | 9 | 2 | 3 | 4 | 6 | 5 | 1 |
| 6 | 3 | 5 | 8 | 1 | 7 | 2 | 4 | 9 |
| 4 | 7 | 6 | 1 | 2 | 9 | 5 | 8 | 3 |
| 8 | 1 | 3 | 4 | 6 | 5 | 7 | 9 | 2 |
| 5 | 9 | 2 | 7 | 8 | 3 | 1 | 6 | 4 |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Ne dixwe ne dide hevalan, genî dike diaveje newalan:**
- Mirovekî çikûz e; pir tima ye.
**Qirêja didanan zik têr nake:**
- Ji bo kesê pir kinoj tê gotin.
**Seyda xwe nake ji her du eyda:**
- Xwe ji yekê jî nake; dixwaze ji tevan sûdê bigire.
**Sêniya xwe di nava lingên xwe de dîtiye:**
- Çikûz e; kinoj e; kund e.
**Sipehên xwe jî nade mirov:**
- Pir tima ye; pir çikûz e.
**Şabaş ji bo Elkê ser hesabê Hemkê:**
- Li ser hesabê xelkê camêriyê dike.
**Timaya çaroxan kir, gore qetand:**
- Ji ber ku timayî kir, pirtir zerer dît.
**Timawo ji hevalan mawo/timayî ji rê mayî:**
- Ji ber ku timayî kir ma tenê.
**Xweş mêvan e, lê ne ti mazûvan e:**
- Mirovekî pir çikûz e; dixwaze her tim ji kîsî xelkê bixwe.

**LI SER REZÎLÎ Û ŞERMEZARIYÊ**

**Cil di bin me de nehişt/cilik di bin me de nehişt:**
- Em hetikandin; em şermezar kirin.
**Cilik ji bin me kişand:**
- Bi heman wateyê.
**Çawa ku tu şivekê li bêvila wî bixî:**
- Pir pê êşiya; rezîl bû; pir li ber xwe ket.
**Da ber bêvila wî:**
- Tein danê; rexneyên giran lê kirin; da rûyê wî; anî bîrê ku xîreta wî nîne.
**Hebana wî teqiya:**
- Bi heman wateyê.
**Hewa wî daket:**
- Quretiya wî jê re nema.
**Min bilûra wî şkand:**
- Êdî weke berê nikare quretiyê bike.
**Serê me tewand/serê me çemand:**
- Em dan şermezarkirin; tiştên wisa gotin (yan jî kirin) em pê hetikîn; tiştên ne di cih de kirin.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

---

## Jinên têkoşer nirxê şoreşê parastin

Şoreşa Rojava an jî Şoreşa Jinê ji bo tevahiya jinên cîhanê bû hêvî, ev şoreş li dijî pergala netewe-dewlet ya ku dixwest jinê tune bike, bû mîna volkanekê ku jin hemû mirovahiyê biparêze û bibe hêviya serdemê.**R-2**



## Hediye Yûsif: Şoreşa 19'ê Tîrmehê şoreşa rêvebirina gelan e

Çalakvana siyasî Hediye Yûsif destnîşan kir ku Şoreşa 19'ê Tîrmehê pergala Rêveberiya Xweser kir modela cîhanî û wiha got: "Şoreşa gelan bû rêveberiyeke gelerî."**R-3**



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1291 | 20-Tîrmeh-2025 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

## Hisên Şawîş; Evîndarê çiya û jiyana azad



Şoreşger, rewşenbîr, helbestkar û kedkarê zimanê Kurdî Hisên Şawîş bi dilsoziyeke mezin 30 salan bênavber têkoşîneke bêhempa da meşandin.**R-6**

# ŞOREŞA 19'Ê TÎRMEHÊ BERHEMA KEDA GELAN E

Di 19'ê Tîrmeha 2012'an de çirûska yekemîn a Şoreşa 19'ê Tîrmehê ji bajarê Kobanê yê berxwedêr dest pê kir û li tevahî herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê belav bû. Bi têkoşîna hevpar a gelên herêmê û bi pêşengiya jinan destkeftiyên mezin hatin bidestxistin. Şoreşa 19'ê Tîrmehê 13 sal ji têkoşîn û berxwedanê li pey xwe hişt û ji tevahî cîhanê re bû mînaka têkoşîn, wekhevî û hevgirtina gelan.**R-5**



## 33 Rêwiyên Xeyalan



Şoreşa Rojava 13 sal in li hemberî hemû zehmetî, êriş û dorpêçan li ser piyan e. Li hundir û derve li hemberî hemû astengiyan, şoreş roj bi roj firehtir bû. Di nav şer, windahî û wêraniyan de, şoreşeke ku ji cîhanê ra bibe hêvî, pêk hat. Bê guman, ev roj bi saya şehîdên bêhejmar hatin. 33 Şehîdên Pirsûsê jî di nav wan nemiran de cih girtin.**R-4**

## 'Huner dengvedana şoreşê ye'



Endamê Tevgera Çand û Hunera Demokratîk a Mezopotamiya li Sûriyê Sîpan Xelat destnîşan kir ku huner rengek ji rengê xweparastinê ye; "Huner bû wesîleya mezinkirin û dengvedana Şoreşa Rojava." **R-7**



**HTŞ'ê rêbazên Baasê yên qirkirin û îmhayê li Sûriyê divejîne!**
Idrîs Henan R-5



**Kurmê hevrîşimê û têkoşîna Kurdan**
Hafiz Ahmet Turhalli R-6



**Zimanê Azadiyê**
Remezan Olçen R-7

# Jinên têkoşer nirxê şoreşê parastin

Şoreşa Rojava an jî Şoreşa Jinê ji bo tevahiya jinên cîhanê bû hêvî, ev şoreş li dijî pergala netewe-dewlet ya ku dixwest jinê tune bike, bû mîna volkanekê ku jin hemû mirovahiyê biparêze û bibe hêviya serdemê.

**Dîlan Mulhim\Qamişlo**

Şoreşa 19’ê Tîrmehê ji bo jinan jiyanek nû afirand û da qazanckirin. Ji ber ku her dem zilm û zordarî li dijî jinan dihat meşandin. Lewra jinên têkoşer bi rengê xwe şoreş xemilandin û her parastina nirxên şoreşê kirin. Rojava 19’ê Tîrmeha 2012’an de, bi pêşengiya jinên Rojava dest pê kir û li tevahiya cîhanê deng veda, di heman demê de ji tevahiya jinên azadîxwaz yên cîhanê re bû mînaka berxwedanê. Li kêlek wê jinên Rojava di hemû qadên jiyanê de, bi rola pêşengtiyê lîstin û xwe pêş xistin.



Derbarê rola jin di şoreşa 19’ê Tîrmehê de, endama Koordîrasyona Kongra Star Bêrîvan Xalid ji Rojnameya me re axivî.

**‘Xemlandina şoreşê bi rengê jin’**

Bêrîvan Xalid diyar kir ku Şoreşa 19’ê Tîrmehê bi pêşengtiya jinên têkoşer hat afirandin û wiha got: “Jinên Rojava hemû qadên berxwedanê bi rengê xwe xemiland û parastina nirxên şoreşê kirin. Ji bo wê jî Şoreşa 19’ê Tîrmehê ji bo tevahiya gelan roja jîn û vejinê ye. Gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi têkoşîna salan gihaştin 19’ê Tîrmehê. Herwiha Şoreşa Bihara Gelan a ku li Sûriyê dest pê kir, çirûska wê gihaşt warê berxwedanê Kobanê ya Rojavayê Kurdistanê. Tevî ku sîstemên desthildar rê nedidan pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, bi taybet jin ku xwe birêxistin bikin. Li civak û jin bi salan bi rengekî dizî xwe birêxistin dikir, hem jî sîstemên xwe ava dikir. Lewra di destpêka şoreşê de, bingehekî gel yê têkoşîn, rêxistinbûyîn û avabûnê hebû. Li ser vê bingehê di sala 2012’an de gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê xwe birêxistin kirin û barê şoreşê girtin ser milên xwe û “Şoreş” wek gava dîrokî dît. Şoreş jî di xeta sêyemîn de hat diyarkirin, da ku karibe tevahiya gelan di nava xwe de biparêze û hembêz bike, jinê jî rola herî pêşeng û girîng di şoreşê de girt ser milê xwe.”

**‘Jin her dem bi kirasê koletiyê hatiye pêçandin’**

Bêrîvan Xalid eşkere kir ku Şoreşa Rojava, şoreşa jinê ye û wiha pê de çû: “Pêşengtiya jina Kurd ji Şoreşa Rojava re, bû nimûne ji bo tevahî jinan mîna jinên Ereb, Suryan, Tirkmen, Çerkez û hwd. Jinê ne tenê pêşengtî kir, lê di hemû qadan de jî cihê xwe girt, hem jî gelek guhertin û veguhertin dan avakirin û gavên berbiçav di hemû qadan de kir, bi taybet qada leşkerî û siyasî. Lewma li ser asta cîhanê bû hêvî û sembol. Ji ber dema em li dîorkê vegerin û bi taybet li dîroka dema nêz a desthiladariya mêr meyze bikin, tê xuyakirin ku jin her dem bi kirasê koletiyê hatiye pêçandin û ji hemû mafan bêmaf maye. Lê bi saya ramanên Rêber Apo ev kiras qetand û rêya ber bi azadiyê hilbijart.”

**‘Jinê sînorên hişmendiya desthilatdariyê derbas kir’**

Bêrîvan Xalid da zanîn ku jinan qad bi qad cih girtin û wiha pê de çû “Li Rojava civak li ser hişmediya sîstemên desthildar hatibû avakirin, ev sîstem jî rê nedidan jinê ku cihê xwe di gelek qadan de bigre, mîna, siyasî, leşkerî, diplomasî û hwd...ji bo wê jî gelek zehmetî di destpêka şoreşê de hatin kişandin. Lê bi perwerdekirinê heta astekê hişmendiya civakê heta guhertin û gav bi gav jin karî cihê xwe di hemû qadan de bigre û sînorên hişmendiya desthilatdariyê derbas bike. Tişta balkêş di îro de jî ew e ku jin ne tenê şoreş birêve dibe, lê şoreş bicih kir û parastina nirxê wê jî dike. Ev yek jî bi cihgirtina jinê di nava sazî, destgeh û hwd... de pêk hat. Destkeftiya herî binirx û pîroz a şoreşê jî ew bû ku jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi pêşengtiya jinên Kurd hêza xwe ya bi navê Hêzên Yekîniyên Parastina Jin YPJ’ê ava kir, her ku diçe jî hêza YPJ’ê mezin dibe û têkoşîna wê di Rojava de, bû mînak ji jinên cîhanî re. Li kêlek wê jin sîstema hevsrokatiyê di komîn, sazî, mecils û hwd li Bakur û Rojhilatê Sûriyê pêş xist û teyisand.”



**‘Pêwîst e em asta têkoşînê mezin bikin’**

Endama koordînasyona kongra Star Bêrîvan Xalid axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Jinên Rojavayê Kurdistanê zagonên xwe afrandin û îro cihê xwe di nava meclisên gelan de girtin e. Herwiha gelek destkeftî bi saya jinên berxwedêr li Bakur û Rojhilatê Sûriyê hatine bidestxistin. Helbet heta roja îro ew destkeftî li hemberî êriş û tunekirinê tên. Ji ber vê yekê jî, ji jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê tê xwestin ku van destkeftî û nirxê şoreşê biparêzin. Parastina van destkeftiyan jî erkekî pir mezin û sereke li ser milê me ye. Ji ber ku di vê demê xeteriyeke mezin li ser destkeftîyên me hene. Hem jî ev hikumeta veguhêz ya Şamê mafê jin bi tu awayî napejrîne û mafê wê paş guh dike. Ji ber vê yekê pêwîst e em asta têkoşîna xwe mezin bikin, da ku em karibin rola xwe di Sûriya nû de bilîzin.”

# Şoreşa jinê guherîna jiyanê ye



**Birûc Resûl**

Zîhniyeta zilamê desthilardar ya ku 5 hezar sale jinê di nav pençê qirkirinê de fetisandiye. Mejiyê paşverû nahêle ku jin di nava civakê de bibe xwedî rol û pêşeng. Dixwazin ku jin tenê di bin xizmeta mêr de be. tê dîtin ku çawa ev dewletên desthilatdar bi hemî kiryar û nêzîkatiyên qirêj êrişî jinan dikin, Ev rewş nîşan dide ku dewlet ji vê polîtîkayê aciz nîne, berevajî vê yekê piştgiriyê dide polîtîkayeke wiha pûç, zehniyeta ku niha li Sûriyê tê meşandin ji zihniyeta sîstema Esed ne dûr e bi rakirina yek al, yek ol û yek partî. Em ne li dijî kesên ku Sûriyê bi rê ve dibin, em li dijî zihniyeta paşverû ne, zehniyetekî wiha wê nikaribe Sûriyê bi awayekî aştî û demokrasî bi rêve bibe ku heya roja îro komkujî li ser gel, jin û zarokên Sûriyê pêk tîne. Ji ber ku zehniyeta cîhadîst dimeşîne û hewl dide fikra DAIŞ’ê careke din li Sûriyê nûjen bike. Hilweşandina sîstema Baasê piştî şerê 14 salan gavek ji bo Sûriya nû, baş bû. Bi hatina Heyet Tehrîr El Şam li ser desthilatdariyê re, gelek metirsiyan bi xwe re anî. Pêwîste di Sûriyê de sîstema demokratîk were avakirin ku hemû pêkhateyan di nava xwe de bigre û bi taybet ku jin dinav de cih bigre. Rola jinan di cihê biryardayînê de bê pêşxistin. Tiştên ku li Sûriyê niha diqewimin jî beravojî, hêviyên gel in. bêguman jin rewşekî bi vî rengî û sîstemeke wiha paşverû qebûl nakin. Li hemberî vê zehniyeta seqet jin têdikoşin û jin nîşan didin ku bi têkoşîna xwe hene û naxwazin ku êdî xizmetê ji mêr re bikin, ji ber vê yekê hewil didin mejiyê serweriya mêr bişikînin. em dizanin ku cihê jin lê tune be, aştî jî wê dûr e, ya ku aştî bi xwe re tîne jin bi xwe ye.

Bêguman piştî şer û aloziyên li Sûriyê hat destpêkirin şoreşa Rojava ku bi şoreşa jin hat bi navkirin, ji ber ku yê pêşengtiya vê şoreşê kir, jin bû. belê heya roja me ya îro jî dewam dike. Jinê Bakur û Rojhilatê Sûriyê û bi taybetî jinên kurd ku li dijî hemû hêzên ku dixwestin siyaseta xwe ya olparest, netewdewlet, cîhadîst û nîjadparestî li ser civak û jinan bidin meşandin. Bi vê siyasetê û rêbazî dixwestin jiyana jinan bixin tarîtiyê de, da ku nikaribin pêşiya xwe bibîne. Bêguman jinên Rojavayê Kurdistanê di serî de li hemberî siyaseta hegemon a rejîma BAAS’ê serî hildan û li hemberî çete û terorên DAIŞ`ê şer kir û bûn sedem ku jiyana gelek jinan ji metirsiyê xilas bikin. Belê jin xeta sêyem xeta projeya Rêber Apo, projeya Xweseriya Demokratîk da pêşiya xwe û li ser vê esasê têkoşîna xwe da destpêkirin. Heta roja me ya îro ev tekoşîn dewam dike û her diçe asta tekoşîn û berxwedanê bilindtir dike.

Jinên Rojava ne tenê şerê çekdarî dan meşandin, bi îradeyekî pir xurt li hemberî ew hişmendiya ku her jin dide asîmilekirin, tekoşîn kir. Îro jî jin karîbû hişmendî jî bide guhertin. Ji ber vê yekê em dikarin bijin ku şoreşa jinê guherîna jiyanê ye. Ji bo pêşxistina şoreşa jinan, girîng e ku jinên karker, kedkar û bindest ên ji hemû netewe û bawerîyên Kurd, Ereb, Ermenî, Tirkmen, Durzî, Êzîdî, Xiristîyan û Elewî, di têkoşîna li dijî dagirkerî, mêtingeriyê û îstismarê da bibin yek û xwe bi rêxistin bikin.



# ‘Huner dengvedana şoreşê ye’

Endamê Tevgera Çand û Hunera Demokratîk a Mezopotamiya li Sûriyê Sîpan Xelat destnîşan kir ku huner rengek ji rengê xweparastinê ye; “Huner bû wesîleya mezinkirin û dengvedana Şoreşa Rojava."

**Lîloz Hisên/Qamişlo**

Di şoreşên gelan de huner qadeke têkoşînê pir giring bû. Li Rojavayê Kurdistanê jî bi destpêkirina şoreşa 19’ê Tîrmehê re sektora hunerê bi awayekî hevkar ji bo belavbûna tevgera şoreşgerî pêş ket. Di riya hunerê de bal hate kişnadin li ser şoreşê û hişt ku pêkhateyên dîtir jî tevlî tevgera şoreşgerî bibin.

Bi şoreşê re huner geş û pêşket, bû dengê gelê herêmê, şoreşê îfade kir û bûyerên wê tomar kir, xemgîniya wê vegot û şehîdên wê bi bîr anî. Wê rolek di parastina coşa şoreşgerî û geşkirina agirê wê de lîst, wêneyek têkoşîn û rizgariyê pêşkêş kir, ku ji armancên Şoreşa 19’ê Tîrmehê ji bo wê hate destpêkirin.

Di riya hunerê de hewildan hate kirin ku sûcên dagirkeran bê eşkere kirin herwiha desrxistina berxwedan û têkoşîna gel û şervanan di riya stranên cihêreng, şano, fîlim, govend û helbestan û ji xeynî van ji hunerê ..

Debarê rola hunerê di şoreşa Rojava de endamê Tevgera Çand û Hunera Demokratîk a Mezopotamiya li Sûriyê Sîpan Xelat ji rojnameya me re axivî.

**Çand û huner rengeke parastina hebûnê ye**

Sîpan Xelat di destpêka axaftina xwe diyar kir ku çand û huner rengeke ji rengê xweparastinê ye û wiha anî ziman: “Lewma her dem êrişî di riya wê dihat kirin, gelê Kurd jî tevî van kiryaran têkoşîn û berxwedaniyeke pir mezin didan meşandin û heya niha jî berdewam dikin. Gelek kesayet ji bo şerê tunebûnê bikin û parastina hebûna gelê Kurd; şoreş pêk anîn mîna Qazî Mihemed û Şêx Seid û gelek pêşengên kurd. Di erdnîgariya ku gelê kurd jiyan lê kiriye, gelek bandorên asîmîlasyonê hatin kirin, lê di dema heyî de ji bo berdewamkirina hebûnê weke gelê kurd divê bi çand, huner, ziman, çîrok, stran û helbestan hebûn bê parastin, lewma di her kombûyînekê de çîrokên bav û kalan ku di bîrdanaka mirovan de maye tê vegotin da ku neyê ji bîr kirin. Çand û huner pêkanînek ji bo xweparastinê ye da ku mirov karibin hebûna xwe biparêzin. Guvend stran, çîrok nûnertî û parastina hebûna gelan dike.”

**‘Li Sûriyê hewildanên helandinê têk çûn’**

Sîpan Xelat diyar tekez kir ku bi sedê salan degirkeran dixwestin nasname û çanda Kurdî bihelînin da ku koka gelê kurd ji holê rakin û wiha dewam kir: “Lewma bi parçekirina Kurdistanê di nava 4 dewletên ku bi awayekî domdar ji dema dgirkirinê hewil dan bi pêkanîna sûc û kiryarên hovane di riya tepisandin û qedexekirina çand û hunera kurdî, hebûna kurdan tune bikin. Lê li hemberî van kiryaran têkoşînek bêhema hate kirin.

Çand û hunera kurdî bi awayekî veşartî dihat xebat kirin, gelek hunermend hatin girtin, kuştin û bi salan di zindanan de man, ev hunermendê ku xebat dikirin tevî zextên mezin hêviyên wan hebû ku rojekê bi azadî çanda xwe derxînin pêş, lewma li Sûriyê bi taybet piştî destpêkirina şoreşa 19’ê Tîrmehê, derfet hate vekirin ji bo vejînkirina çand û hunerê û bi riya wê şoreş di tevahî cîhanê de dengveda.”

Sîpan Xelat da zanîn ku huner bû wesîleya mezinkirina şoreşê û bi awayekî çalak hemî hunermendên kurd yên ku bi awayekî veşartî xebat dikirin, navendê çand û hunerê li hemû bajaran girtin ji bo meşandina xebatên çand û hunera kurdî. Piştî vekirina navendan êdî şano, mûzîk û hunera zarokan pêşket, perwerde di hemû warên çand û hunerê hatin dayîn, ciwanên jin û xort heta bi zarokan tevlî vê qadê bûn ji bo naskirina çand û hunera xwe.



**‘Huner bû stûneke ji stûnên şoreşê’**

Endamê Tevgera Çand û Hunera Demokratîk a Mezopotamiya li Sûriyê Sîpan Xelat di dawî de wiha anî ziman: “Hêviyeke ku ji kevin hatibû veşartin derket pêş, çand û huner di nava şoreşê de roleke mezin lîst ji bo şehîd, hemleyên ku hatin destpêkirin, têkoşîna ku hate meşandin bi muzîk, stran, govend û festîvalên ku hatin li dar xistin bi şoreşê xwe kir yek. Çand û huner bû stûneke ji stûnên şoreşê, bi saya hunerê şoreşa Rojava deng veda û bi lez pêşket di hemû cîhanê de. Hemû saziyên çand û hunerê ketine nava pergaleke nû de, êdî ji hişmendiya kevin ya rêjîmê heta asteke bilind xelas bûn, em ketine wê feqrê ku divê em xwe biparêzin, pêwîste em ji hebûna xwe hez bikin, bandora vê yekê çand û huner e, huner taybetmendiyeke wê cuda heye her kes giringiyê dide vê qadê ji ber ku bi hunerê hebûn û rûmeta gelekî tê parastin ji windabûn û tunekirinê.”

# ‘Wî destana Siyabend û Xecê ji devê du dengbêjan girtiye’

**Reşo Mihemed/ Qamişlo**

**Berzo Mehmûd destnîşan kir ku Luqman Silêman destana Siyabend û Xecê ji devê du dengbêjên Kurd, hem jî li gel kesayetekî Ermenî girtiye. Herwiha Mehmûd diyar kir ku aliyê wêjeyî di vê pirtûkê de li pêş e.**

Luqman Silêman di sala 1963’an de li gundê Hemzebeg ê girêdayî bajarê Dêrikê hatiye dinyayê, di roja îro de li Almaniyayê dijî.

Luqman Silêman nivîskar û çîroknivîsekî Kurd e ku mijûlî folkor, çand, çîrok û romana Kurdî dibe û berheman diafirîne. Ji berhemên wî yên ku vê dawiyê hatine derxistin, Siyabend û Xeçê ye. Ev berhem li Almaniyayê di sala 2024’an de hatiye çapkirin û di 13’ê Tîrmehê de li navenda HRRK’ê hate îmzekirin.

Pirtûka bi navê Siyabend û Xecê, Li cem Kurdan çawa hatiye gotin û li cem Ermeniyan çawa hatiye gotin? Berhemeke nivîskar Luqman Silêman e û bi riya nivîskar Berzo Mehmûd û Fêsel Mecîd hatiye pêşkêşkirin.

Destana Siyabend û Xecê destaneke du evîndarên Kurd e, çîroka keç û xortekî vedibêje, ev çîrok tirajîdîk e. Wî bi şêwazê ku Kurdan vegotiye, nivîsandiye, herwiha bi rêbazê ku Ermenan ev destan vegotiye, ji devê Boxos Lehdo yê Ermenî nivîsandiye.

Derbarê vê berhemê de nivîskar Berzo Mehmûd ji rojnameya me re axivî.

**‘Wî destana Siyabend û Xecê ji devê du dengbêjan girtiye’**

Berzo Mehmûd destnîşan kir ku Luqman Silêman destana Siyabend û Xecê ji devê du dengbêjên Kurd, hem jî li gel kesayetekî Ermenî girtiye û wiha got: “Ev berhem li ser destana Siyabend û Xecê ye, wî li dengê gelek stranbêj û dengbêjan bi riya



radyoyan û tomargehên stranan guhdar kiriye. Ji wan stranbêjan Demir Elî û Ehmedê Meimê ye, Silêman jî destan bi rengê stranî veguherandiye nivîs, di baweriya min de cara yekem e ku xebateke tekûz û resen di warê vê destan de çêdibe. Di heman demê de wî ev destan ji Ermeniyan jî girtiye û rêbazê vegotina destanê li gorî Ermeniyan di berhema xwe de hewandiye. Destan nêzî 6 beşan e, tev jî bi terzê çîrokî û stranbêjiyê hatiye nivîsandin. Min ev berhem radekter kir, wî carnan gotinên destanê yên zimanên din vediguhestin Kurdî, min jê re digot bila weke xwe bimînin ji ber ku çênabe folklorê resen ê Kurdî bê guhertin ango weke ku dengbêj dibêje divê nivîskar jî wê yekê biparêze.”

**‘Aliyê wêjeyî di berhemê de gelekî li pêş e’**

Nivîskar Berzo Mehmûd diyar kir ku aliyê wêjeyî gelekî dagirtî ye di vê pirtûkê de û wiha anî ziman: “Luqman Silêman ji despêka Şoreşa Rojava ve li ser vê berhema xwe xebitiye, vê dema dawî jî çap kir. Piştî ku nêzî 5 romanên xwe çap kirin, wî ev berhem jî çap kir û bi hevkariya HRRK’ê diyarî rewşenbîrên Rojavayê Kurdistanê kir, ew gelekî westiyaye li ser amadekirina berhema xwe. Destana Siyabend û Xecê destaneke bi nirx e û li gorî min ji destana Gilgamêş xweştir e. Di pirtûka Luqman Slêman de aliyê wêjeyî pir li pêş e, çendîn romannivîsên me roman nivîsîne, lê weke xweşbûeke weke ya vê berhemê neafirandine.”



## Zimanê Azadiyê

**Remezan Olçen**

Di sala 14’an a Şoreşa Jinê ya Rojava de venîrîneke kurt a li çand û hunerê me xwest bi vî nivîsê em bikin. Em bînin bîra xwe Kurd, û pêkhayeyên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê beriya Şoreşê rewşa wan bi çi rengî bû û îro roj gel û civak gihîştine çi astê?

19’ê Tîrmeha 2012’an li Rojava şoreşeke mezin a mirovahiyê û bi pêşengiya jin û civakê pêş ket. Ev Şoreşa ku îro roj jî li her dera cîhanê li ser zar û zimanan e bi ilm û feraseta Apoyî bi pêşengiya jinê pêş ket. Gelê Kurd li vî beşê welat êdî zincîrê bindestiyê qetand, perdeya xefk û xefletê qelaşt û bi heqîqeta xwe re li ser kok û rîşala xwe bû yek. Dewra zordestî û zorbatiyê bi dawî kir. Bi ronahiya fikrên Apoyî meşaleyeke di wê tarîtiyê de vêxist û ew meşale îro jî weke pusulayekê rê nîşanî dildarên azadiyê, demokrasî û edaletê dike. Rêber Apo di xebatên xwe de azadiya jinê esas girt. Got; jin jiyan e û divê jiyan azad be. Ma ji vê mezintir xebateke huner û çandeke xurt heye gelo. Hîm û esasê avadaniya şoreşê bi vê hunerê weke ristina berik û xalîçeyeke rengîn kêl bi kêl hat ristin. Şoreşê zimanê xwe çêkir, bi wî zimanê şoreşê çanda kevnar vejiya hunera azad şewq û ronî da.

Em bînin bîra xwe di bin zorbatiya rejîma Baas de rewşa zimanê me Kurdî çawa bû. Em rast bibêjin, mesele tenê li dibistanan ferzkirina zimanê erebî nebû, Kurdî li nav sûkê û malê jî êdî kêm dihat bihîstin. Reng, deng û çîroka gel hatibû tarîkirin, hatibû kerkirin, hatibû jêbirin. Bi şoreşê re dengbêjan êdî li kelam û klamên xwe vegeriyan. Ferhenga zimanê azadiyê xurt bû. Şano bi Kurdî derketin ser dik û sehneyê. Stran bi kurdî, sêwirandina wêneyan bi motîf û temayên kurdewar bûn êdî. Huner li Rojava bi Şoreşê re gihîşt asasê xwe. Xeyal û rastî di wan stranan de, di wan lîstikên şanoyê de, di wan roman, çîrok û helbestan de di wan wêneyên rengên kesk û sor û zer de têkelî hebûn. Sînor neman. Raman azad bû.

Çawan ku di şoreşê de jin pêşeng bû, di xebatên ziman, çand û hunerê de jî jin bi pêşegiya dinya şaş û metel kir. Di her bajar û gundên Rojava de gotin li cih be, jin pêşî xwe bi şoreşê re ji nû ve çêkirin. Bûn hunermendên rastîn, nivîkarîn heqîqî, stranbêj û şanogerên heqîqî qet’en ne mecazî. Ew bi hunera şoreşê gelê xwe çêkirin, bi hunerê bi hunera azadiyê jiyan û gel azad kirin. Ji ber wê ye dema piştî 13 salan em vedigerin li Rojava dinêrin em dibînin ku ev gel û pêkhate ne bi çek û sîlah lê bi fehm û feraset, bi ziman, çand û huner xwe gurçûpêç kirine, xwe bi rêxistin kirine ji lewma jî bûne qibleya nû ya azadiya li seranserê cîhanê. Ev e zimanê azadiyê ye ku çanda xwe diparêze û hunera xwe, kerameta xwe pêş dixe. Ev hunera azadiyê jî zimanê şoreşê ye. Her bijî Şoreşa Jinê ya Rojava.

# 'Şoreşa Rojava şoreşeke rojnamevanî bû'

Hevserokê Daîreya Ragihandinê ya Rêveberiya Xweser Ciwan Mele Ibrahîm diyar kir ku Şoreşa Rojava bû şoreşa rojnamegeriyê, herwiha saziyên ragihandinê û rojnamevan bûn neynika Şoreşa 19'ê Tîrmehê û got: "Bi boneya salvegera şoreşê em soza xwe ya berdewmakirina xebata rojnamegeriyê li ser şopa şehîdên rojanmevan nû dikin."

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Bi destpêkirina aloziya Sûriyê re rêjîma Baas zendên xwe ji bo qirkirina gelên Sûriyê hilda û xwest dengê gelên Sûriyê bifetisîne, gel rabû xwepêşandanên azadiyê. Da ku rastiya dengê şoreşa gelên Sûriyê û bi taybet gelê Kurd bilind û eşkere bibe yekem saziya ragihandina Kurdî bi navê Rojnameya Ronahî di 16'ê Cotmeha sala 2011'an de hat damezrandin. Piştî wê çirûska şoreşa ragihandinê di 19'ê Tîrmeha 2012'an de hat pêxistin, bi dirêjahiya Şoreşa Rojava kovar, rojname, televiziyon, ajans ên xweser ji bo jinê û yên giştî ava bûn. Bi dirêjahiya Şoreşa 19'ê Tîrmehê jî hemû saziyên ragihandinê bin sîwana YRA, YRJ û Daîreya Ragihandinê ya Rêveberiya Xweser de xebatên çapemeniyê dane meşandin.

Derbarê xebat û rola dezgehên ragihandinê yên Rojavayê Kurdistanê bi pêşveçûna Şoreşa 19'ê Tîrmehê ve, Hevserokê Daîreya Ragihandinê ya Rêveberiya Xweser Ciwan Mele Ibrahîm bersiva pirsên rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**-Hûn avabûna saziyên rojanmegeriyê bi destpêkirina Şoreşa Rojava re çawa dinirxînin?**

Berî Şoreşa 19'ê Tîrmehê dest pê bike, tu hebûna ragihandina ku îro em dibînin li Bakur û Rojhilatê Sûriyê tune bû. Kesên ku ji netewa Kurd ên dikarîbûn karê rojnamegeriyê bike tune bûn, diviyabûn alîgirên rêjîma Baasê bana, wekî din eger karê rojnamegeriypê kirbana dihatin girtin. Ji ber wê jî berî şoreş bi dehan kesên ku rewşa civakê dişopandin û derdixistin ji raya giştî re, dihatin desteserkirin û îşkencekirin, an jî ji welat direviyan. Çapemenî û dezgehên ragihandinê tenê yên rêjîma Baasê hebûn û karê rojnamegeriyê dikirin. Em dizanin kovarên Kurdî weke Dengê Welat, Sorgul û hwd… hebûn, lê karê wan veşartî dihat meşandin. Xebata ragihandinê bi rengekî zehmet û veşartî hat domandin heya ku şoreş dest pê kir. Li seranserî Sûriyê guhertin û parçebûn çêbû û bû piralî, di encamê de jî derxistina rastiyan pir zehmet bû ji ber her aliyek girêdayî siyasetekê bû. Li Rojavayê Kurdistanê parçebûn tune bû, herêmên wê rêxistinkirî bû û gavên mezin di warê rojnamegeriyê de hatin avêtin, bi taybet hemxwetê ku teknolojiya li pêş ket. Di mercên zor de dezgehên ragihandinê hatin damezrandin, mîna Rojnameya Ronahî, Ronahî TV, ANHA, Rojava TV, Jin TV û hwd…"

**-Bi dirêjahiya Şoreşa 19'ê Tîrmehê re tevî astengiyan qadên çapemeniyê çawa xwe li pêş xistin û bûn dengê Şoreşa Rojava?**

Bi dirêjahiya Şoreşa 19'ê Tîrmehê re, rewşa herêmê hat guherandin. Êrişên DAIŞ'ê di sala 2014'an dest pê kirin, paşê amadekirina komên çete ji hêla dewleta Tirk a dagirker ve, vê yekê hişt ku çavên cîhanê li ser me be û Rojava bibe mijara her kesî, tarîtî û çewtkirina rewşê ji hêla hêzên desthilatdar ve, ên derve ku berjewendiyên wan di vê yekê de de hebû. Mixa bin ji ber qelsbûna asta rojnamevaniyê li cem me, reşkirina vê şoreşê û berxwedaniya ku gel dida meşandin, çêdibû, me jî nikarîbû bersiva vê reşkirinê bidin û bibin dengê gelên berxwedêr, ev jî dibe cihê rexnedayînê. Ji ber ku bi dirêjahiya şerê li dijî DAIŞ'ê û komên çete berxwedaniyeke bêhempa dihat meşandin, lê ragihandin bi erka xwe ji bo derxistina heqîqeta Şoreşa Rojava ranebû. Lê bi demê re rojnamegeriyê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê pêş ket û bû xwedî asteke ku dikarîbû bibe neynika şoreşa Rojavayê Kuridstanê û civaka Bakur û Rojhilatê Sûriyê. Akademiyên ji bo perwerdekirina rojanmegeriyê hatin avakirin, hem jî televiziyon jî hatin damezrandin. Di vê şoreşê de rojnamevana û dezgehên ragihandinê têkoşîneke pir mezin dan nîşandan û gelek rojnamevanan li ser şopandina rêya heqîqetê şehîd bûn.

**-Da ku destkeftiyên heyî bên parastin û Şoreşa Rojava tacîdar bibe erkê ku dikeve ser milê, rojnamevan, saziyên çapemeniyê, Daîreya Ragihandinê û yekîtiya Raghandina Azad çi ye?**

Berî her tiştî divê em şehîdên xwe bi bîr bînin, şehîdên me yên şopdarên heqîqetê, ew mîrateya me ne. Xwedîderketina li xwîna şehîdan û xebata ku dan meşandin, dikeve ser milê rojnamevanan. Li aliyekî din heta ku em gelên xwe bigihînin azadiyê, divê



rojnamevan jî xwe bikin berpirsyar, em ê çawa gelan bigihînin azadiyê û xeta şoreşê biparêzin? Ev yek bi riya meşandina xebatên rojnameygeriyê pêkan dibe, bi kurtasî divê rojnamevan parêzvanên şoreşa xwe bin û raghandineke welatparêz biafrînin. Ragihandineke welatparêz ku rastiya gel û şoreşê ragihîne cîhanê. Divê rojnamevan heqîqeta gelan û Şoreşa Rojava ya ku berxwedandiyeke bêhempa da û dide meşandin veguhêze ji bo cîhanê. Li hêleke din rojnamevan û dezgehên ragihandinê hewcedarî pêşxistinê ne û pêwîst e ji perwerdeyê qut nebe. Bi boneya salvegera Şoreşa 19'ê Tîrmehê, em pîrozbahiyê li gelê Rojav û tevahiya gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê dikin. Herwiha em weke rojnamevan soza xwe ji bo şehîdên rojnamevan û tevahiya şehîdên Şoreşa Rojava nû dikin ku em ê her tim li ser şopa wan xebata xwe bi domînin. Heman demê bi pêşketinên ku Sûriyê diqewimin re, em ê bixebitin da ku bigihêjin bingeke sereke ji bo Sûriyeke demokrat-nenavendî. Pê re jî em ê projeyên Rêveberiya Xweser, hemû projeyên demokratîk û projeyên gelêrî bişopînin û li tevahiya Sûriyê belav bikin û pêk bînin.

# Hisên Şawîş; Evîndarê çiya û jiyana azad

**Hêvî Keleş/ Qamişlo**

**Şoreşger, rewşenbîr, helbestkar û kedkarê zimanê Kurdî Hisên Şawîş bi dilsoziyeke mezin 30 salan bênavber têkoşîneke bêhempa da meşandin.**



Evîndarê çiya û jiyana azad Hisên Şawîş, nexwest mala xwe ya mezin, "xwezayê", biterikîne, lê belê îlhama xwe ji bedewiya Kurdistanê, çiya, xweza û çemên wê girtiye. Ji bo ku bibe şoreşger, nivîskar, helbestvan û rêber Hisên Şawîş (Herkol Dêrik), Wî riya şoreşê li dijî zordariyê hilbijart.

**Kurtejiyana Şehîd Hisên Şawîş**

Fermandar û şoreşgerê kurd Hisên Şawîş di 1958"an de, li gundê Birûc ê li herêma Koçerat a girêdayî bajarê Dêrikê ji dayîk bûye. Wî dibistana xwe ya seretayî heta amadeyî li bajarê Dêrikê qedand, piştre berê xwe dide Şamê û li wir tevlî Enstîtuya Çandiniyê dibe. Şehîd Şawîş di ciwaniya xwe de bi hewesa xwe ya ji bo lêkolînê dihat naskirin, ew tijî zindîtî û çalak bû. Di sala 1984"an de, wekî alîgirek di nav refên Tevgera Azadiyê de şer kir. Di sala 1985"an de tevlî Tevgera Azadiya Gelê Kurd bû. Ji vir, têkoşîna xwe ya bêwestan li dijî zilm û zordariya hikûmetên li Tirkiye û Sûriyeyê û zextên ku wan li ser gelê Kurd pêk dianîn dest pê kir. Taybetmendiyeke berbiçav a vê têkoşînê lêgerîna mafên dizî bû. Di dema têkoşîna xwe ya gelêrî de, ew di navbera gelek herêmên Rojava û Sûriyeyê de, ji Şamê heta Helebê, Amûdê û Dêrikê, geriya. Ew ji bo doza Kurd şer kir û fikra têkoşîn û berxwedanê di nav girseyan de belav dikir û wan birêxistin dikir.

**Pirtûk û kar û xebatên wî**

Wî pirtûkek bi navê "xwendina civakî çandî dîrokî- xêzên windayî ji jiyana civaka Koçerî"derxist, naveroka pirtûkê li ser dîrok û jiyana koçera ji hemû aliyan e. Ji bilî wê komeke helbestan bi zimanê Kurdî bi navê Li hev kombûn û Pênûsa min`jî. Û helbestên Nîzar Qubanî wergirandiye zimanê kurdî, li gel wê jî gelek çîrok, lêkolîn û gotar ku wan di gelek kovaran de belav dikir.

**Ew pazdeh salan di zindanên Tirkiyê de ma û di pêşengiya şoreşa Rojava de bû**

Dema ku ew bi hevalên xwe re di kemînekê de ji aliyê Tirkan ve hate girtin, dîwarên zindanê nehiştin ku ew di girtîbûnê de têkoşîna xwe bidomîne. Di girtîgehê de dest bi hînbûna zimanên Kurdî û Tirkî kir. Ew her wiha li ser dîroka gelê Kurd jî kûr bû, û zanîn û çanda wî mezin bû, ji ber ku wî di perwerdekirina hevalên xwe de beşdar bû. Wî ji bilî nivîsandina helbestan ji bo îfadekirina hestên xwe yên hundirîn, dest bi nivîsandina gotar û lêkolînan jî kir. Wî di pazdeh salên zindanê de jiyana xwe ji nû ve şekil da, ku ev yek hêviyên wî ji bo jiyan, têkoşîn û berxwedanê xurt kir. Û di sala 2005"an de Şawîş dema xwe ya zindanê qedand û Tirkî wî teslîmî Sûriyê kirin, piştî ku wî azadiya xwe bi dest xist, di nav gel de dest bi têkoşînê kir, ji ber ku di warê zimanê Kurdî de xwedî zanîbûneke dirêj bû. Ew bû ê ku tecrûbekiriyê çalakiyê gel bû û ew xwezaya gelê Rojava baş nasdikir. Ew karîbû bi kesayeta xwe ya nerim, hevseng û çanda wî ya dewlemend bikeve nav dilê gelê Kurd. Ew kesekî jîr û zane bû, wî feriq nedixist navbera biçûk û mezin, jin û mêr, zengîn û xizan de. Têkiliyên wî bi civakê re çavkaniya îlham û moralê bilind bûn. Wî bi pênûs û nerînên xwe ji bo çi tiştên ku zirarê bide berjewemndiyên gelê Rojava têdikoşiya, herwiha ew têdikoşiya di warê edebî de li gel yê siyasî.

Ew pazdeh salan di zindanên Tirkiyê de ma û di pêşengiya şoreşa Rojava de bû. Serokê Yekîneyên Parastina Gel, Hisên Şawîş, piştî ku rêya şoreşê li dijî zilm û zordariyê hilbijart, gelek serdem û qonaxên dijwar dît û derbas kir. Wî jiyaneke tijî têkoşîn û berxwedanê bi tîpên zêrîn nivîsand.

## Kurmê hevrîşimê û têkoşîna Kurdan



**Hafiz Ahmet Turhalli**

Henek Kurd jêre dibêjin Kurmê Qozan. Bi Tirkî dibêjin (Îpek Bocegî û bi Erebî Dûdet alqez)

Kurmê hevrîşimê kurmekî gelekî biçuke, dema ez zarok bûm me weke malbatî bazirganiya wê dikir. Neha ez tekoşîna gelê Kurd û bi taybet sîstema xebata Rêberê Kurd mêze dikim, ew mucîzeyên xwezayê tîne bîra min. Kurm bi perê dara tuyê tê xwedîkirin. Me despêkê pir hindik perê darên tuyê bi kêrê hur dikir û dida vî kurmî. Biqasî çengekî cîh digre, her dixwe mezin dibe. Her roj me darê tuyan pelê wan jê dikir û didan van kurmên qozan. Piştî pênc hefteyan Kurm pir mezin dibin û ew rengên wanên gewr, hêdî hêdî ber bi zerbûnêve diçe. Piştî dibe zer, me şiklekî ji darên mazî yê pelê wan mezintir jê dikir, hiş dikir guliyên wê darê bi tevê pelên wê datînan ser hevrîşman. Hevrîşman xwe di nava wan pelan de bicîh dikir û ji devê xwe tevn an bi gotinekî din tora xwe davêt û hêdî hêdî Qoza xwe dihûnand. Ew kurm di hundirê Qozaya ku çêdikir têde dimir. Mirov nikare wa Qozeya Hevrîşimê bi kêra tuj qul bike an biqetîne. Hevrîşim an bi gotara Tirkî ew tiştê ku navê wî îpeke, pir giranbuhaye. Pir sivik bû, lê ezîyet û xizmeta wê zêde bû, lê dahatekî baş çêdikir.

Bi keda pênc şeş hefteyan, me perekî baş qezenc dikir. Ecêba giran bi qasê dussed Qozeyan me dihiştin ji bo sala pêşî weke toxim. Me dikir kîsên ji padisqayê û devê wî hişk girê didan. Di demekî kurt de ew Kurm di nava Qozayê de dibûn perperîk, Qoza diqelaşt qul dikir jê derdiket. Wê perperîkê jî bi hezaran hêk dikir, ew hêk jî, carekî din dibûn kurmên hevrîşimê.

Serokê gelê Kurd Rêber Abullah Ocalan û bizava wî, weke vê hevrîşimê di gelek şert û mercên giran de, tekoşînekî mezin ya hebûnê dan meşandin. Dewleta Tirkan got me Kurd kuştin di mezelên beton de bicîh kirin û carekî din ne mumkine ku Kurd zindî bibin.

Berê 52 salan li Enqerê Rêber Abdullah Ocalan weke wê perperîkê qozeya xwe qelişand û bû perperîkekî ku banga azadiyê li Kurdan dikir. Li hemû derên Bakurê Kurdîstanê geriya û li her deverê tovên azadiyê çinand. Wekî wê perperîkê ku hevrîşmê çêdike firda Rojavayê Kurdîstanê. Li Biqaa ya Lubnanê hêlîn çêkir û bi deh hazaran perperikên azadiyê ber bi Kurdistanê ve bi rê xistin.

Ev perperîk di hemû çiya û deştên Kurdistnê de bicîh bûn. Wanan jî bi xwîna xwe bi deh hezaran perperîk çêkirin, ew perperîk jî qozeyên xwe qelişandin û firyan çûn çar hêlê cîhanê. Neyarên Kurdan çiqas ew kuştin, ew ewqas zêde bûn. Neha jî Rêber Abdullah Ocalan ji girava Îmralî Qozeya xwe carekî din qelişand û bû perperîk. Ji bo azadiya gelê me û welatê me misoger bike, dest bi firîna duduyan kir. Vê carê kesek nikare vê perperîkê azadiyê bigre. Ev azadî bûye hişmendî, bûye hest, bûye heqîqet û eqlê Kurd yê pêşketî. Hişmendî û rihê azadiyê vê carê kesayet bi kesayet, gund bi gund, bajar bi bajar û welat bi welat digere.

Serkeftina hişmendiya Civaka Demokratîk wê azadî û aşitîya milletê Rojhelata Navîn bi xwe re bîne.

Em hemû bibin Kurmê Hevrîşimê û perperîkên azadiyê.



# Hediye Yûsif: Şoreşa 19'ê Tîrmehê şoreşa rêvebirina gelan e

Çalakvana siyasî Hediye Yûsif destnîşan kir ku Şoreşa 19'ê Tîrmehê pergala Rêveberiya Xweser kir modela cîhanî û wiha got: "Şoreşa gelan bû rêveberiyeke gelerî."

**Argêş Vîyan/Qamişlo**

Di derbarê rola rêveberiyê û pergala Rêveberiya Xweser ya şoreşa 19'ê Tîrmehê de, çalakvana sîyasî Hediye Yûsif pirsên rojnameya me bersivandin û naveroka hevpeyvînê wiha bû:

**- Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê şoreşa 19'ê Tîrmehê çi guhertin û veguhertin xwe re pêş xist?**

Destpêkê de ez salvegera 19 Tîrmehê, salvegera vejîn û hebûna pergala demokrasi ya li ser vê xakê pêkhatiye, serî de li avakerê vê felsefê Rêber APO û Malbatên Şehîdan, gelê Kûrd, hemû gelên Bakur, Rojhilatê Sûriyê û tevahî Sûrîyê pîroz dikim û şehîdên me yên Leheng ku canê xwe bê teredud feda kirin bi rêzdarî bibîrtînim, bejna xwe ber lehingiya wan ditewînim. Dîroka 100 salî ya inkar û helandina çanda gelê me de, cara yekem bû ku li Rojavayê Kurdistanê serhildana gel bi şoreşa 19 Tîrmehê re encam girt. Ev qonaxeke gelek girîng bû, ku mirov bi rêzdarî qala wan bike. Welatparêziya ku ruxmî hemû siyaseta inkar, helandin a ku ferz kiri jî, lê bi tekoşîna ku Rêber Apo li Bakurê Kurdîstanê dest pêkirî, şewqa xwe da Rojavayê Kurdistanê jî û ew hes û ruhê welatparêziya kûr de olan da, bû rêxistin, bû hêza civaka rêxistin kirî, ya xwedî nirxên giran bûha, di şexsê şehîdên ku li çiyayê kurdîstan xwîna xwe rijandin bû hebûneke mayind e. Bê guman ruxmî ku rejîma Baas'ê siyaseta inkar, girtin, işkence, dana koçberkirin, feqîrtî, hejartî, û gelek kiryarên failê mechûl kirin jî lê azîmet û israra azadî û jiyana bi rumet nekarîn ji holê rabikin. Bi tekoşînek dom dirêj de û herî dawî bi serxistina şert u mercên welatên derdor de hatîn jiyîn, encam kirina serî hildanekî wekî tê zanîn re jî rê vekir. Şoreşa 19 Tîrmehê di hembêza welatekî xwedî rejîmeke zalim, inkarker de rê li pêşiya guhartineke dîrokî vekir. Bê guman wekî me li jor aniye ziman Şoreşa 19 Tîrmehê ji valetî derneket holê, ew encama ked û tekoşîna 29 salan ya tevgera Azadiya gelê kurd bû ku li Rojavayê Kurdîstan û Sûriyê jî bû bersiv. Jêr zemîna ku vê tekoşînê ava kiribû, her wiha zanista xwe rêxistin kirina civakî, leşkerî, bîrdozî, bo bersiva daxawazên şoreşê. Valahiya siyasî ya ku avabû bi tevlîheviyên ku li Sûriyê jî çêbûn, qelskirina rejîma serdest, pêwîst dikir ku ev gel bi pêşengên xwere biryarekê bistînin û ev biryar hat standin. Li ser wê bingehê şoreşa 19 Tîrmehê hat destpêkirin. bajar bajar hatin rizgar kirin, rejîm ji herêmên me hatin derxistin, rewşek şoreşa ku pêwîste xwe ava bike bi gelek pirsgirêkên cuda cuda derket holê. Pirsek wiha dikeve hişê mirovan, gelo her tişt amadebû ku civak ji hemî milê xwede bi rêvebirin? Herkes ji bo derxistina Rejîma Baas'ê, parastina herêmên hatîn rizgar kirin amadebûn. Bi hezaran keç û xort ketin ser riya şoreşa 19 Tîrmehê. Tevlîbûn ji her milî de misoger bû. Ev rewş li hemî Bakur û Rojhilatê Sûriyê belav bû, lê gelek pirsgirêkên civakî, siyasî, aborî, çandî û her wiha bi xwere hanî, ya herî zehmet jî hişmendiya rejîma desthilatiya mêr ya di şexê feraseta Dewlet Netewe di hiş û zihnê mirovan de. Şoreşa 19 Tîrmehê ji bo van pirsgirêk û vê hişmendiyê bû bersiveke xurt û bi rengekî serkeftî li beramberî hemî zehmetiya hate roja me ya îro jî têkoşîn dike .

**- Piştî şoreşa 19'ê Tirmehê, pergala Rêveberiya Xweser hat damezirandin. Bi vê pergalê we şêwaza hevserokatiyê di aliyê jiyana hevpar de çi pêşketin avakirin din av civakê de?**

Şoreş ji şoreşa netewekê bû ya tevahî gelê Sûriyê û modêla Rêveberiya Xweser ya ku pala xwe dide ramanên netewa Demokratîk ya ku Rêber Apo ji mere pêşkêş kirî, bû cihê ezmûnê, her weha nîşaneya gelên herêm û cihanê. Rastiya şoreşa me we ku tê zanîn bi şerê DAIŞ'ê re, asta qehremanî, israra azadiyê, demokrasiyê, jiyana hevbeş de bû xwediyê hebûneke gerdûnî û berê her kesî da şoreşa me. Ji şoreşa mere raya giştî ava kir. Piştgirên tekoşîna me pir bû û hêzên Hevpeymana Nav Dewletî hat Rojava û dengeyên siyasî li hember gelê me da guhartin. Ev jî destkeftiyeke mezin bû. Li ser wê hîmê, rastiyê gelek rehendên me biratîya rêxistinên civakî bi civaka biyanî re ava kirin, di qada perwerdê, dad, şaredarî û hwd. Navê Rojava, yan jî navê Bakûr û Rojhilatê Sûriyê li herderî hat naskirin. Hin hikûmetên we ku Katalonya jî rêveberiya me naskir, li gelek welatên Ewrupî û Ereb nûnertiyên Rêveberiya Xweser hatin vekirin. Her çiqas hîna Şam hûkûmeta wê çiqas demkiye jî hîn rêveberiya me na pejirîne jî lê nûnertiya me û gelek saziyên me li Şam û gelek deverên Sûriyê de jî hatin vekirin, kar û xebatên li hev hatinê û çareser kirinê jî tene rêvebirin. Pejirandina gelê Sûriyê, taybetî piştî komkujiyên Elewiyan zêdetir ketin famkirina rastiya Şoreşa 19 Tîrmehê. Gelek destkeftiyên madî û manewî yên ku em qala wê bikin hene, Ji ber wê yekê pergala hevserokatiyê pergala rêveberina azad û demokrasiye bû. Bi tevahî xebatên şoreşa Rojavayê Kurdistanê bi pergala hevserokatiyê ya ku bi paradigmaya Netewên Demokratîk tê rêvebirin. Ji ber pergala rêveberiyê di cîhanê de wek wê tine ye, gelek serkeftin hatin bi dest xistin. Bi pergala hevserokatiyê nûnerê Kurdan çên Şamê û nûnertiya gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê kirin. Ji ber wê sedemê ramanên Rêber Apo bû hîmên şoreşa Rojava hûnand. Sîstema şaredariyên demokratîk ya ku bingeh de rengê modêla meye ev çend salê şoreşê ne ku di vê mijarê de jî tekoşîneke mezin tê meşandin. Rûxmê gelek pirsgirêkên ku hîna jî nehatine çareserkirin jî lê dîsa jî em dikarin bêjin bawerî û hişmendiya ku şaredarî wê şêweyî modêla demokrasî misoger bike hatiye ava kirin û pirsgirêkên xizmet gûzariyê û rêxistinkirina pêdiviyên gel û rêxistinkirina hemî mijarên girêdayê jiyan gel ve di asteke mezin de gav hatin avêtin, em dikarin bêjin dewletek ancaq dikare ewqas bibe hêz, ruxmî hemî astengiyên şer me karî jiyanê herikbar bikin û nehêlin gelê me rewşên we ku xezê, yan jî sudan jiyan bikin . afrandin û zindîbûna civaka me li ser lingan hişt.

**- Di pergala Rêveberiya Xweser û hevserokatiyê de jinên herêmê şoreşa 19'ê Tîrmehê gelek rola xwe lîst. Pêwîste ev deskeftiyên ku bi pêşengiya jinên Kurd de, hatiye bi destxistin çava bê parastin?**

Rojeva bingehîn ewê di pêşerojê de bandorê li pêşeroja Sûriyê bike zanebûna civakê ya rastiya vê şoreşê ye û guhartina hişmendiya netewperestiyê ye, jiyana hevbeş ya li Rojava pêş dikeve ye. Hêza leşkerî ya rêxistin kirî, perwerde kirî, nîşaneya hêza hişmendîya zayendî û birdozîye. Rastiya ku vê dawiyê li bendava Tişrîn hate jiyîn vê rastiyê teqez dike. Ketina ferqa hebûnê gelek girînge. Heta mirov nekeve ferqa hebûna xwe, nikare bi xwe bawer be, nikare bibe xwedî siyaset û stratejî. Nikare bibe xwedî dîrok û paşeroj. Pîvanên jiyana bi çand, Exlaq, li ser vê rastiyê pêş dikeve. Ji bo tu hebûn ava bikî, roja xwe, pêşeroj û paşeroja xwe bi rêxistin û parastin bikî gereke hebûna xwe ya leşkerî jî biparêzî we ku mafek rewa biparêzî, zindî bihêlî, zêde bikî . tezmînata pêşerojeke azad ev rastiyeke nebe nabe ye. Hestûyê jiyana bi ewleye. Disa aboriya civakî ya komînal dide avakirin û ji bo ku civak bibe xwedî aboriyeke xweser sistema koparatîfan li pêşve biriye û li pêş dixe. Pirojên ziraet û senayî destek dike û hûnera aboriya civakê pêve dibe. Gelek pirsgirêk hîna divê mijarê de tê jiyin, sermaya kesan û tekelbûnê hîna diyardeyeke berbicav e, lê belê armancameme ewe ku em aboriya civakî ya komînal li pêş bixin û heta niha gavên baş hatine avêtin. Ev jî guhartineke mezine û deskeftiyeke civakîye û gereke li ser wê em bi israr bin, ta ku em renge feqîrtî, perîşaniyê bi temamî ji nav civaka xwe derxînin. Ji bo ev ava bibe li akademiyên rehenda Aboriyê perwerdeya avakirina hişmendiya wê têye kirin. Pêwîste jinên herêmê tevahî yên fikrên cûda jî bên rêxistin kirin û qirkirina zilamên serdest bên parastin.

**-Şoreşa 19'ê Tîrmehê bû hemû gelên tevahî Sûriyê çi avakir û ji aliyê hemû pêkhate û gelan de, 19'ê Tîrmehê çava dikare bê nirxandin?**

Ji yek deskeftiyên girin jî pêşketina ku di rehenda çand û hûnerê de li herêmên Rêveberiya Xweser de li pêşketine. xwesertiya çand û di heman wextê de di qada perwerdê de bi sere xwe şoreşeke . di wexta şoreşan de ya ku tê zanîn çand û exlaq û pergala perwerdan tê hilweşandin. Lê di şoreşa gelan de ev herdu rehend bi zindîbûneke mezin xwe bi lez rêxistin kir û bû nîşaneya manewiyata gelê me di şerde rolek mezin lîst û gelek hûnermend û şagirtên zanîngehên me û mamostên me şehîd ketin gelek zehmetî hatin jiyiyîn lê belê her çu ev qad xurt bûn û mezin bûn û asta xuluqkariyê derket asta herî jor. Niha fakultên çand û hûnerê hem yê xweser bi jin hem yên giştî , disa zanîngehên me ji diktoran, huquqiyan, muhendisan, mamosteyan … û her wha gihandin civakê û ew niha ji bo avahiyeke ser hîmê neteweya demukratîk bi tendurust ava bibe rol dilîzin. Bi sê zimanên sereke fermiyeta



xwe avakir, herkes xwedî mafe ku bi zimanê dayika xwe bixune, ser vî esasî ji refa yek heta sîstema zanîngehan bêyî ku dewlet esas bigre bi hezaran şagirt bi xwendin û kirina xwedî azmon da avakirin. Bûye nîmonek ku nîha sîstema zanîngehên wê li gelek welatan bûye mijara nîqaşan û destek tê dayin. Cara yekeme ku li Sûriyê dibistanên kurdî têne vekirin û zarok bi zimanê dayikê xwendina xwe dikin. Şoreşa 19'ê TÎrmehê şoreşekê gelan bû û hemû zarokên xaka Bakur û Rojhilatê Sûriyê têkoşîn û berdel dan.

Rangihandina azad jî ji yek deskeftiyên maezin vê şoreşê ne, wan ev şoreş, guhartinên ku avakiriye, berxwedaniya mezin, hebûna demukratîk, rastiya sistemên diktator û faşist teşhir krin, terora DAIŞ û berxwedana serkeftî gihandin her derî, weke rehendeke sereke xwedî rol bû û ragihandineke azad, di nav tekoşîna wêde rolek mezin girt û gelek kadroyên hêja feda kir. Xwe di her beşî de rêxistin kir, hemî dezgehên xwe bi rêxistin kir, ev bi sere xwe gaveke gelek mezine. Dengê xwe yê civaka xwe, tekoşîna xwe gihand her derî û di mezinkirina şoreşê de rolek gelek mezin lîst.

Hêjayî gotinê ye ku em balê bikşînin ser ciwanan. Ciwan rola herî dînamîk di vê şoreşê de lîstin, û bedelin gelek mezin dan, ciwan cara yekeme ewqas xwedî rolek rêxistin kirine, û niha bi sedan karê girêdayî ciwanên hemî pêkhatan bi rêve dibe, her weha hêza garantor ya parastina jiyana gelê me, rolek mezin di parastina axlaqê civaka mede listin. Her wiha di heman demê de jî şoreşa Rojava bû şoreşekê gelan û xwe nûve vejîn kir. Bi hemû pêkhetayan mil dan mile hev şerkir û di encam de jî pergala Rêveberiya Xweser rêvebirin.

# 33 Rêwiyên Xeyalan

**Ekîn Isyan**

Şoreşa Rojava 13 sal in li hemberî hemû zehmetî, êrîş û dorpêçan li ser piyan e. Li hundir û derve li hemberî hemû astengîyan, şoreş roj bi roj firehtir bû. Di nav şer, windahî û wêranîyan de, şoreşeka ku ji cîhanê ra bibe hêvî pêk hat. Bê guman, ev roj bi saya şehîdên bêhejmar hatin. 33 Şehîdên Pirsûsê jî di nav wan nemiran de cih girtin. Di dîroka şoreşa Rojava de wek xalek girîng a zivirînê, divê komkujîya Pirsûsê bê vegotin.

Li dijî çeteyên DAIŞ'ê yên ku dewleta Tirk a girker û înkarker ew piştgirî dikir, li Kobanê berxwenek efsanewî hat nîşandan. Di berxwedana Kobanê ya ku wek Stalingrad a sedsala nû di dîrokê de cih girt, Îslama siyasî ya paşverû ya çeteyên DAIŞ'ê têk çû. Di vê berxwedanê de welatparêz, anarşîst, sosyalîst, enternasyonalîst û komunîst jî hebûn. Bi taybetî, enternasyonalîzma hevgirtinê dîsa zindî bû. Çav û guhên hemû cîhanê li kolanên Kobanê bûn. Li dijî êrîşên çeteyên tarî yên DAIŞ'ê, berxwedaneke mezin hat meşandin. Wek ku di sîrû antîfaşîst a dîrokî tê gotin, "No Pasaran ji wan ra ne veşartî bû"; şervanên ji her ziman û neteweyî bi hev re şer kirin û Kobanê azad kirin. Di wê demê , Erdogan gotibû "Kobanê ket, wê bikeve" û armancên xwe anîbû ziman. Lê Kobanê neket û bi berxwedana xwe, dengê şoreşa Rojava li hemû cîhanê belav kir. Di vê berxwedanê de, di nav gelek şervanên nemir , welatparêzên sosyalîst û komunîstên marksîst-lênînîst jî hebûn.

### Me bi hev re parast; Em ê bi hev re ava bikin

Di sala 2015'an , li Tirkiyê û Bakurê Kurdistanê, ciwanên di bin sîwana Federasyona Komeleyên Ciwanên Sosyalîst de kom bibûn, hemleyek destpêkirin. Bi dirûşma "Me bi hev ra parast,em ê bi hev re ava bikin", hemleyek ji bo çûna Kobanê hat destpêkirin. Pêngav, li şûna kampên havînê yên ku her sal dihatin rêxistinkirin, armanc dikir ku ciwan rûyê xwe ber bi şoreşê ve bizivirînin. Ji her beşên civakê, bi pêşengîya ciwanên sosyalîst, mirov hatin ba hev. Di çarçoveya hemleyê de, ji bo ji nû ve avakirina Kobanê, xebatên ristan, park, pirtûkxane, nexweşxane û zanîngehê û herwiha xebatên cûrbecûr ên di çarçoveya xizmetên şaredarîyê de hebûn. Armanca sereke, ev bû ku mirov karibe destê xwe bide şoreşê û kolanên Kobanê yên bi berxwedanek mezin azad bûne. Bi mirovên li erdnîgariya şoreşê re hevdîtin, di navbera gelên Tirkiyê, Bakurê Kurdistan û gelên Rojava pirek ava kirin. Bi vî awayî, xwestin fikra şoreşê bigihînin mirovan.

Ciwanên sosyalîst, di çarçoveya hemleyê de, xebatên berfireh kirin. Ji karkeran heta kedkarên malê, ji bijîşkan heta xwendekaran, gihîştin her beşên civakê. Bi pêşengîya ciwanan, bi sen mirovên Ermenî, Çerkez,Tirk, Tirkmen, Laz û Kurd, bi alîkariyên ku kom kiribûn, ketin rê. Kom berî ku sînorê Kobanê derbas bike, li navçeya Pirsûsê ya Rihayê, li Naven Çandê ya Amara hat ba hev. Di 20'ê Tîrmehê , daxuyanîyeka çapemenîyê li r xistin û dê sînor derbas bikirana. Lê di dema daxuyanîya çapemenîyê , çeteyên DAIŞ ew kirin hedef. Bombeyek zindî di dema xuyanîya çapemenîyê xwe teqand. Di wê kêlîkê ku dirûşmên "Ji Arîn heta Sibel, em ber bi serketinê ve dimeşin" dihatin qîrîn, teqîn çêbû. Naven Çandê ya Amara bû cihê êrîşa hovane.

Ev hemleya ciwanên sosyalîst, planên dewleta Tirk a dagirker û înkarker têk bir. Yekbûna gelan û îhtîmala belavbûna şoreşê bi vê yekê, dewleta Tirk a dagirker û înkarker ditirsand. Çeteyên DAIŞ yên ku dewletê xwedî û perwerde dikirin, dema êrîşî şoreşa Rojava dikirin, li sînorên Tirkiyê, çek û lojîstîk ji wan ra dihat dayîn. Li bajarên nêzî sînorên Tirkiyê, kampên perwerdê yên çeteyên DAIŞ hebûn. DAIŞ gelek êrîşvanên xwe bi îmkan û derfetên dewleta Tirk perwerde dikir û amade dikir. Komkujîya Pirsûsê jî yek ji encamên van derfetan e.

Piştî êrîşê, polîsên Tirk nehiştin ku birîndar bigihêjin nexweşxaneyan. Hem li wesayîtên ku birîndaran dibirin û hem li Navdên Çandê ya Amara bombeyên gazê hatin avêtin. Nehiştin ku ambulans derbas bibin. Piştî komkujîyê, gelek rastîyên din derketin holê û îspat kirin ku dewleta Tirk ev êrîş bi taybetî plan kiriye.




Komkujîya Pirsûsê bû bûyerek ku têkçûna proseya çareserîyê û plana dewleta Tirk a şer ragihand. Piştî komkujîya Pirsûsê, bi şertên faşîzmê yên roj bi roj girantir bûn, xwestin gelan teslîm bigirin. Demildest piştî vê, di 10'ê Cotmehê de, komkujîya gara Enqereyê çêbû û 103 mirovan jîyana xwe ji dest dan. Gelek kesên ku di nav wan parlamenterên HDPê jî heyî hatin binçavkirin. Cezayên girtîgehê yên giran, xirabûna şertên zindanan, girantirkirina tecrîda li Îmralîyê, destpêkirina êrîşên giran li ser Herêmên Parastinê yên Medyayê, bi dagirkirina Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî berdewam kir. Di vê pêvajoyê de, armanc astengkirina tevgera girseyî, belavkirina tirs û bêhêvîtîyê bû. Ji bo tirsandina şoreşgeran û teslîmgirtina tevgera neteweyî ya Kurd, êrîşên hovane hatin kirin. Ji bo têkbirina şoreşa Rojava, êrîşên dagirkerîyê hatin kirin. Bi tora sîxûrên MÎTê, planên ji hundir ve têkbirina şoreşê hatin çêkirin. Di vê pêvajoyê de, hevrêyên nemirên Pirsûsê bi biryarrî rêya xwe berdewam kirin. Hemla ku ciwanên SGDF'ê li dar xistibû, ji alîyê siyasî ve di cihê ku rê li pêvajoyê vedike de bû. Hem derfetên afirandina tevgera şoreşger a yekbûyî bû û hem jî xwe spartibû perspektîfa şoreşa yekbûyî û şoreşên herêmî. Bi gotina "Me Kobanê bi hev re parast" banga xwedîderketina li bedelên hatine dayîn dikir. Bi gotina "Em ê bi hev re ava bikin" bang li hemû gelan dikir ku tevlî şoreşê bibin û şoreşê mezin bikin. Di êrîşê de 33 rêwîyên xeyalan nemir bûn. Gelek mirov birîndar bûn. Di nav de 33'an Çerkez, Tirk, Laz û Kurd hebûn. Pirsûs bû çalakîyeka ku mirovên ji neteweyên cu bi hev ra bibûn stêrk. Yekîtî û hevgirtina gelan û sînornebûna di navbera parçên Kurdistanê de , yek ji mînakên herî mezin bû.

Di nav 33 kesan 10 jin hebûn. Jinên ku temen, pîşe û neteweyên wan cu bûn, ji bo ji nû ve avakirina Kobanê nemir bûn. Di nav 33 kesan pêşengên ciwanên sosyalîst hebûn. Cebraîl Gunebakan di rêbertîya ciwanên komunîst bû û yek ji rêxistinkerên çalakîyê bû. Polen, Ezgî, Ayn, Büşra, Ece û jinên ciwan ên kadroyên pêşeng ên ciwanên sosyalîst bûn. Okan û Alican ên hîn pir ciwan hebûn. Yunus Emre, Nurullah, Emrullah û ciwanên Kurdistanî şervanên bêwestan ên xewna şoreşê bûn. Cemîl Yildiz, Nazgûl Boyraz, Duygu Tuna, Îsmet Şeker û navên din, di her temenî wek karkerên şoreşê di dîrokê cih girtin. Nartan û Ferne serkêşîya goven ku gelên Kurd û Çerkez destê hev girtibûn, kirin. Alper, Çağş, Evrim Deniz, Kasim, Koray, Melî, Murat, Nuray, Osman, Serhat, Vatan, Veysel, Sîleyman, Uğur, Erl, Nazli û Mert, goven wan mezin kirin. Kervana xeyalên 33an hat rêzkirin.

Piştî komkujîyê, tewîya gelek kesan demeke dirêj berdewam kir. Piştî vê komkujîyê, hin kes wek gazî jîyana xwe berdewam kirin. Şandina nemiran li gelek bajaran veguherî çalakîyên biheybet. Malbatên şehîdên Pirsûsê platform ava kirin û têkoşîna edaletê domandin.

### Ciwanên Komunîst ên Şoreşger li ser Şopa 33'an in

Di şoreşa Rojava , hevrêyên 33 nemirên Pirsûsê di xeta welatparêzîya sosyalîst dimeşin, her sal bi bîranînên ku li r dixin, 33an bibîr tînin. Bi dirûşma "Dê xeyalên wan nîvco nemînin", Ciwanên Komunîst ên Şoreşger ên di heman rêyê dimeşin, bi xebatên xwe xeyalên şehîdên Pirsûsê temam dikin. Parastina şoreşê, li dijî girkerî û mêtingehkarîyê têkoşîn, di sengerên şer ji bo şoreşa Rojava şer kirin, rêxistinkirina çalakîyên wek Tişrîn û grevên birçîbûnê, di şopa şehîn meşîn û bi sekneka layiqî wan, di nav ciwanan xwe rêxistin dikin.

Bi komkujîyê, hêvî û xewnên şoreşê hatin hedefgirtin. 10 sal di ser komkujîyê ra derbas bûn. Îro, cihê ku şoreşa Rojava gihîştiyê careka din îspat kir ku xeyalên şehîdên Pirsûsê nîvco neman. Kolanên Kobanê her kêlî bi berxwen û têkoşînê girtî ne. Ew zarokên ku di salên komkujîyê biçûk bûn, îro di nav refên YPJ û QSD'ê , di Tabûra Şehîd Serkan şer dikin û şoreşê diparêzin. Şoreşa Rojava dikeve saleka nû ya têkoşînê û nemirên Pirsûsê careka din bi rêz û minetrî bibîr tîne.



# Şoreşa 19'ê Tîrmehê deriyê hest û ramanê xwe ji tevahî netewan re vekir

Di 19'ê Tîrmeha 2012'an de çirûska yekemîn a şoreşê ji bajarê Kobanê yê berxwedêr dest pê kir û li tevahî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê belav bû. Şoreşa 19'ê Tîrmehê 13'ê sal ji têkoşîn û berxwedanê li pey xwe dihêle, di nava van 13'e salan de ji cîhanê re bû cihê hêvî û aştiyê.

**Amara Baran/ Qamişlo**

Şoreşa Rojava bi xwîna hezarên ji ciwanên Kurd, Ereb Sûryan û Asûr ve hatiye avakirin. Ev şoreş bû modela sedsala 21'emîn ku tevahiya gelê bindest di nav dilê xwe de hembêzkir, hem jî deriyê hest û ramanên xwe ji bo tevahiya netewan vekir.

### Şoreşa Rojava modeleke alternatîfe

Rêber Apo ji bo rastiya gel û civakê bi salan xebat û têkoşîn meşandiye, hîn jî dimeşîne û li ser hîmê netewa demokratîk perwerde kiriye, ev yek jî bi şoreşa ku di 19'ê Tîrmeha 2012'an de li Rojavayê Kurdistanê hate lidarxistin, nûjen bû. Şoreşa Rojava, bi pergala xwe ya "Neteweya Demokratîk" a ku bi pêşengiya jinê hatiye afirandin hemû gel di nava xwe de hembêz dike û li seranserî cîhanê bû modeleke alternatîf.

Di sala 2010'an de li welatên Ereban pêla serhildanê li Tûnisê dest pê kir, gav bi gav herikî nava her bajar û welatî de û navê vê serhildanê bû "Bihara Gelan". Ev bihar di sala 2011'an de derbasî Sûriyê bû. Gelê Sûriyê bi hemû pêkhateyên xwe yên ku bi salan di bin zilma rejîma Baas de dijiyan, rabûn ser piyan. Vê rabûnê heqîqeta xwe ya herî şênber û pîroz di pêngava 19'ê Tîrmehê de pênase kir. Ji ber şoreşa 19'ê Tîrmehê ku weke şoreşa gelên Rojavayê Kurdistanê hate nasîn, di nava demeke kin de veguherî şoreşa hemû gelên Sûrî. Herwiha gelên Ereb, Sûryan, Çerkez, Ermen, Tirkmen bi baweriyên xwe yên cihêreng ve, pênaseya xwe ya şênber di nava şoreşa 19'ê Tîrmehê de dîtin.

### Bi serhildanên gel "Bihara Gelan" dest pê kir

Di destpêka sala 2011'an de yekemîn serhildana gel di herêma Sûriyê de, bi daxwaza azadiya mafê xwe û bidawîkirina desthilatdariya dîktatoriya Beşar Esad ve, dest pê kir. Ew serhildan di nav dilê Rojhilata Navîn de wek Misir, Lîbya, Sûdan, Iraq Yemen û hwd... de berbelav bû. Serhildan piranî li welatên Ereban pêş ket. Gel di xwepêşandanên xwe de banga azadî, wekhevî û demokrasiyê kirin. Ew Serhildan wekê "Bihara Ereban" hate binavkirin. Di heman salê de li parêzgeha Deraa ya Sûriyê de jî serhildanên gel dest pê kirin û pêvajoya geşedanan derbasê Sûriyê bû, di nav demek kurt de bi dûrişmeya "Gel dixwaze Rejîmê biguhere" Xwepêşandanên girseyî li tevahiya bajarên Sûriyê belav bû.

### Daxwaza gelan rêveberiyek demokratîk e

Serhildanên ku hatin lidarxistin li ser daxwaza ku rêveberiya gel demokratîk bibe û gel bi vîna xwe rêveberiya demokratîk hilbijêre, hem jî pergala heyî biguhere. Li şûna wê pergaleke demokratîk û edlane ava bibe. Gelek hêzên heremî û yên hegoman mûdaxaleyê pêvajoyê kirin û ji ber wê jî Sûriyê kirin qada şer û nakokiyan. Çawa ku şerê demokrasiye ji bin kontrola gel hat derxistin, wê çaxê jî şerê desthilatdariyê ku serweriyê li ser Sûriyê çêbikin, ji aliyê siyasî û leşkerî de dest pê kirin.

### Çirûska Şoreşê li ser felsefeya Netewa Demokratîk ava bûye

Gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ku bi salan di siyasêta înkar û îmhayê re derbas dibûn, bi hîmê şoreşê re careke din hebûna xwe destnîşan kirin. Şoreşa 19'ê Tîrmeha 2012'an li ser felsefeya "Netewa demokratîk" ava bûye. Çirûska yekem a şoreşê di sala 2012'an de li herêmên kurdan dest pê kir û bi awayek bilez li giştî heremên Bakur û Rojhilatê Sûriyê yên ku ji çeteyên DAIŞ'ê rizgar bûne, belav bû.

Şoreşa 19' Tîrmehê berhema mîras, têkoşîn û xebata tevgera Rizgariya Kurdistanê li Sûriyê ye. Şoreş li avahiya partiya Baasê ya li Kobanê dest pê kir. Wê demê gel şaxên ewlehiyê yên baasê neçar kirin ku radest bibin û ji bajêr derkevin. Di heman deme de gelek navendên ku girêdayê baasê bûn hatin rizgarkirin, avahiyên ku hatin rizgarkirin jî bûn navenda perwerdehiya gel.

### Kobanê sembola aştiyê ye

Kobanê ya ku dergûşa şoreşa 19'ê Tîrmehê ye, di sala 2014'an de bû sembola cîhanê ya tekoşîna demokrasiyê li dijî pergala hegemon. Di Îlona 2014'an de çeteyên DAIŞ'ê bi piştgiriya yekser a dewleta Tirk êrişî Kobanê kir. Lê piştî Rêberê gelan Rêber Apo seferberî ragihand, bi sedan ciwan û keçên Kurd berê xwe dan cihê têkoşînê "Kobanê", di heman demê de Kurdên li her çar parçeyên Kurdistanê, ciwanên ji welatên cûda berxwedaneke dîrokî raber kirin. Di encamê de çeteyên DAIŞ'ê cara yekemîn têk çû.

### Di nav êrişan de Rêveberiya Xweser hate ragihandin

Kanûna 2014'an bû qonaxeke dîrokî di Şoreşa Rojava û tevahî herêmê de. Di vê dîrokê de gelên Rojavayê Kurdistanê Rêveberiyên Xweser li 3 kantonan; Cizîr, Kobanê û Efrînê ragihandin. Her rêveberiyekê sazûmaniya xwe li gorî sîstemên rêveber ên cîhanê (rêveberî, qanûnsazî û dadgerî) hilbijart û saziyên xwe yên xizmetguzarî, çandî, ewlehî, perwerde, sivîl, rêveberî û civakî, vekirin.

### Projeya Rêveberiya Xweser sîwana kombûna pêkhateyan ne

Piştî têkçûyîna çeteyên DAIŞ'ê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê, projeya Rêveberiya Xweser belav bû, ji Kobanê ber bi Efrînê û Cizîrê, piştre jî ber bi Reqa, Tepqa, Dêra Zor û heta taxên Eşrefiyê û Şexmeqsûd yên Helebê ve çû. Şoreş tenê di Kobanê de asê nema, li gelek deveran jî xwepêşandanên gel çê bûn û daxwaziya rêveberiyekî xweser ku mînaka wê Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye, kirin. Avakirina pergala Rêveberiya Xweser a Demokratîk ku xwe dispêre felsefeya Rêber Apo, ji bo kurdan û tevahiya gele heremê bû cihê kêfxaşî û dilgeşiyê. Ji ber ku cara yekem bû ku gel dikarî xwe bi xwe rêve bibe û bi awayek rihet di hemû qadan de tev bigere.

### Rêveberiya Xweser ji bo cîhanê bû hêvî



Pergala Rêveberiya Xweseriya Demokratîk ku bi malên gel, komîn û meclisan dest pê kir û hat bi pêşxistin ku gava yekemîn bi avakirina Malên Gel (2012) li herêm, bajar, bajarok û gundên rizgarkirî hat avêtin. Li wan herêman, gel bi rêya civîn û dewreyên perwerdeyê girîngiya birêvebirina xwe bi xwe di hemû aliyan de têgihîşt. Di wê pêvajoyê de mijara girîng û sereke mijara ewlehiyê bû. Li ser vê esasî gel bi avakirina pergaleke xweparastinê yekemîn gavên xwe avêt û komên biçûk ên parastinê ava kirin. Ya girîng jî pêşxistina têkiliyên di navbera pêkhateyên herêmê de yên ku ji ber siyasetên sîstemên desthilatdar hatibûn parçekirin, pêk hat. Di aliyê pêşxistina îradeya jinê û pêşkêşkirina xizmetan de jî gavên destpêkê hatin avêtin. Piştî ku pergala Rêveberiya Xweser hat damezirandin, Hevpeymana Civakî hat amadekirin. Di hevpeymanê de zimanên Kurdî, Erebî û Suryanî wek zimanên fermî hatin qebûlkirin û rê li pêşiya pêkhateyên din hat vekirin ku zimanê xwe fêr bibin. Li gorî hevpeymanê, rêjeya temsîliyeta jinan di saziyan de herî kêm ji sedî 50 hat diyarkirin û hat gotin ku divê pêkhateyên cûda yên herêmê di pergala Rêveberiya Xweser de cih bigirin.

### Nûbûna Hevpeymana Civakî

Bi mezinbûna pergalê re di aliyê civakî, siyasî, aborî û perwerdeyê de jî nûbûn hatin çêkirin. Di 12'ê Kanûna 2023'an de Hevpeyaman Civakî ji nû ve hat nivîsandin û erêkirin. Li gorî hevpeymana nû ku ji 4 beşan û 134 xalan pêk tê, di pergala Rêveberiya Xweser de guhertin hat çêkirin û navê herêmê weke Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê ya Rêveberiya Xweseriya Demokratîk hat hilbijartin. Dîsa pergala herêman (Cizîr, Firat, Efrîn) hat rakirin, kanton esas hatine girtin. Li gorî vê yekê herêm ji 7 kantonan (Efrîn-Şehba, Cizîr, Kobanê, Minbic, Reqa, Dêrazor, Tebqa) pêk tê. Li gorî Hevpeymana Civakî, qanûna yekîtiya şarêdariyan, qanûna komîseriya bilind a hilbijartinan û qanûna dabeşkirina îdarî hat derxistin.

### Êrişê Dewleta Tirk ji bo têkbirina şoreşê

Dewletên dagirker li hemberî berfirehbûn û bandora sîstema xweser rasterast êrişî herêmê kirin. Dewleta Tirk a dagirker 20'ê Çileya 2018'an bi komên çeteyan êrişî Efrînê kir. Li dijî dagirkeriyê berxwedaneke dîrokî ya 58 rojan hat nîşandan. Lê mixabin Efrîn 18'ê Adara heman salê hat dagirkirin. Di 9'ê Cotmeha 2019'an de, di salvegera Komployoya Navneteweyî ya dijî Rêber Apo pêk hatibû, dewleta Tirk a dagiker vê carê êrişî Serêkaniyê û Girê Spî kir, ew jî bi êrişên hovane dagir kirin. Êrîşên dewleta Tirk ji bo dagirkirina axa Bakûr û Rojhilatê Sûriyê heta roja me ya îro jî berdewamin dewleta Tirk piştê ku Efrîn û Serê Kaniyê dagirkirin ji vî sûd girtin û ketin nava hewildana êrîşên cur be cûr, ji bo ku tirsekî di nav gel de çêbikin, bi balafirên şer pêşengên civakê kirin armanç.

### Bi têkçûyîna Baas HTŞ'ê hewilda destkeftiyên şoreşê têk bibe

Rejîma Baas di temenê xwe yê ku 60 sal tije kiribû, bi destekdayîna hêzên derve ji aliyê HTŞ'ê ve di nav çend rojan de hat hilweşandin. HTŞ' bi destekdayîna hêzên derva û Dewleta Tirk xeyal dikir ku destkeftiyên şoreşê têk bibe ku sîstemekî îslamî li Sûriyê û pêrepêre li Bakûr û Rojhilatê Sûriyê bide avakirin. Di sala 13'mîn a şoreşê de pergala Rêveberiya Xweser êdî ketiya rojeva herêm û cîhanê. Li aliyekê bi taybet dewleta Tirkiye plana têkbirina sîstema xweser dike dewrê yê, li aliye din Rêveberiya Xweser li gel hewildanên diplomatîk ji bo naskirina statûya herêmê jî, gavên girîng diavêje. Gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji bo parastina destkeftiyên şoreşê cane xwe li hember hemû cûre êrişan kirin mertal. Dewleta Tirk a dagirker ku carekdin bi hemû heza xwe êrîşê Bajarê minbicê kir û di 10 Berfanber a 2024'an de bajarê minbici ji aliyê çeteyên dewleta Tirk ve hat dagirkirin. Dewleta Tirk serkeftina k udi bajarê minbicê de bi dest xistibû xeyal dikir ku di bendava Tişrîn û Pira Qaraqozaxê de jî bi dest bixe.

Mînaka wî yekê Bendava Tişrînê û Pira Qara Qazax bû ku gelê Bakûr û Rojhilatê Sûriyê bi hemû netewên xwe Kurd, Ereb, Sûryan û hwd.. ku 118 Rojan şev û roj ji bo parastina av ax û enerjiya xwe di nobetê de bûn. gelek pêşengên şoreşa rojava di parastina bendavê de canê xwe kirin mertal û gîhaştin asta şahadetê. Ji 7 heta 70 salî xwedî li destkeftiyên şoreşê derketin. Dewleta Tirk û Çeteyên girêdayî wî li hemberê îrade û berxwedana gelan carekdin têk çûn.

## FENER



### HTŞ'ê rêbazên Baasê yên qirkirin û îmhayê li Sûriyê divejîne!

**Idrîs Henan**

Ji ber zihniyeta desthilatdariyên xwestine xwe bi zorê mayînde bikin de, Sûriyê kirîzek gelek kûr jiyan dike. Îro jî HTŞ'ê heman xeta kirîza ku di şexsê Baasê de gûrtir kiribû, dewam dike û dixwaze bi heman zihniyetê otorîteya parçe dike û hikûm dike dewam bike.

Bajarê Siwêda û gelê me yê Durzî ne aliyê yekem e ku rastî vê êrişa hovane tê. Gelê Kurd xwedî ezmûna herî mizin di Rojhilata Navîn û Sûriyê de ye ku rastî êrişên îmha û qirkirinê hatiye. Êdî bûya çavkaniya mînakê û lêvegera gelan a dersgirtin û tedbîrgirtinê. Lew re jî tişta îro li Sûriyê hewl tê dayîn carek din di kesayeta HTŞ'ê de zindî bibe, heman feraseta kujer a şerjê dike ya DAIŞ'ê ye.

Tişta berê li ser Kurdan li Efrîn, Serêkaniyê, Girê Spî û Şengalê bûye, çawa ku êrişa mezin bi ser Kobanê û Efrînê ve ajotin, îroj tê xwestin li Siwêda jî were ceribandin û pratîkirin. Wisa difikirin ku divê hemû pêkhateyên Sûriyê bê parastin bihêlin. Lew re jî çawa li Beravê, bi piştgirî û xiniziyek navneteweyî, derbas bû, difikirin wê li deverên dîtir ên Sûriyê jî heman tişt be. Ji bona vê jî, bi nêzîkatiyên siyasî yên çelûxwar û yên dûrî rêgezên exlaq û polîtîk, li dijî gelên Sûriyê û pêkhateyên wê yên olî û etnîkî, hevpemanên dersînor çêkirin û wisa bawer dikirin ku meşrûiyeta esas a ji derve ye. Lew re jî gel bê wate kirin û îradeya wî ya avakirina Sûriyeke pirrengî û demokrat û fedekariya wî ya 14 salan ji nedîtî ve hat. Gelê Durzî û bajarê Siwêda, bi dirêjahiya aloziya li Sûriyê re, weke terefê sêyem tevgeriya ye û helwesta xwe ya li dijî rejîma Baasê jî eşkere kirine. Zarokên xwe ji nav leşkeriyê kişandine û nehiştina bibin şirîkê komkujiyan. Hemû terefên Sûriyê û pêkhatiyên wê pêşwazî kirine û rikberiya li dijî Esad jî hembêz kirine. Bi awayekî aştiyane xwe bi rê ve birine û sîstema xweparastinê, li qasî derfetan, qewîmtir kirine.

Li dora Siwêda û hinek terefên hundirê bajar û gundewarên wê, çawa ku li Rojavayê Kurdistanê kemberên nijadperest û qanûnên Îslah El-Aradî û desteserkirina araziyên sînorî hatin pratîzekirin û sîstema Baas dest avêt demografiya Kurdan, li wir jî erebên bi navê Bedewiyan hatin bicihkirin û weke xencerekî xistin neksa Durziyan. Bedewiyên li wî milî her girêdayî navenda desthilatê bûn. Ango bi Baasê û DAIŞ re êrişî Durziyan kirin û îro jî bi HTŞ re jî êriş dikin. Piştî têkçûna hêzên wezaretên HTŞ, îroj carek din hewl hewl tê dayîn bi awayê zikmakî yê HTŞ ji nû ve xwe tenzîm bikin û êirşên pir dijwar ên qirker bibin ser Durziyan. Hewce nake mirov du caran li van êrişan temaşe bike, derhal rêbazê dagirkeriya Tirk, çeteyên wê û şêwazê DAIŞ tê bîra mirovan. Wê çaxê mirov têdigihêja ku êdî otorîteya xesibkar a HTŞ, tevî hemû firsendên hundirê Sûriyê û yên navneteweyî, nikare qalibên xwe yên tundrew derbas bike û hewl dide, bi qasî pêzanîna xwe ya seretayî ku pala xwe ji Baas wêdetir daye zor û şîdetê, hikumraniya xwe tekûz bike. Ji ber vê jî em dibînin îroj bi şiklê herî kirêt ê rêbazên şerê taybet, bi navê êl û eşîran xwe restore dike û tevna civakî ya Sûriyê vedirişîne. Bi bayê nefret, tolhildan û nijadperestiyê hevgirtina çandî ya Sûriyê hedef digire û hevbeşiya ku yakîtiya axa Sûriyê û pêkhateyên wê esas digire derb dike. Dixwaze bi rêbazên nêçîrê otorîteyeke nû ya ji Baasê xirabtir, li Sûriyê ava bike.